Demê PKK çekê xwe dane

Ehmed Miho Hacî

Berî çend heyamekan, gelek ji mîdiyayên cîhanî, nûçeyek ragehand ku hêzên leşekerê Tirkî opirasyonek kitûpir dijî PKK ê di kûratiya erdê herêma Kurdistanê de, encamdaye. Paşan û her di maweyekî pir zû de, ew nûçe ji bal wezaretên derve yên Tirkî û Îraqî û Emirîkî bi direw hatin derxistin. Ji aliyekî din ve û li gor nûçeyan hikumeta Tirkî roj bi roj, hêzên xwe yên leşkerî li ser sînorên herêma Kurdistanê zêde dike ku ew yek jî, çi bi aşikirayî çi bi nihênî, bûye gefek li ser aramiya herêma Kurdistanê. Bi her halê hebe û li gor tirikan, her opirasyonek bihê encamdan jî, çi di nava erdê wan bi xwe de be, çi li pişt sînorên herêma Kurdistanê be, her mebest jê, lêdana pingeh û livînên PKK ê ye. Carê çi ev gotin rastbe yan jî ji rastiyê vala be, emê pirsyarekê bikin: Erê bi (qirkirina) PKK ê, doza kurdî dê li tirkiya bi dawî êt?

Li vê derê, weka bersiveka destpêkî, ez dibêjim weku tiyor belku jinavbirina bizaveka weka ya PKK ê -bo nimûne-tiştekî beraqil be, bi taybet di pîverên leşkerî de, lê vê yekê di warê piraktîkî de, çend rastiya xwe heye? Eve xala giring

PKK û her ji sala dest bi karbûna xwe, weka hêzeka siyasî û çekdar di gelek astan re derbazbûye, caran kêrvê wê bilind bûye û caran jî hind nizim bûye ku hindik mabû xwe li dîwarê sifrê bide, lê jinav neçûye. Helbet wê bilindbûn û nizmbûnê jî, sedemên xwe yên xweyetî û babetî j hebûne, lê her çawa be, îro ew jî bûye rastî û eleminteka karîger di terazûya aramiya deverê de û helbet pitir di nava laşê dewleta tirkiya bi xwe de jî. Niho vê yekê berê me da pirsiyarek din ku pêdivî ye em bersivê li ser bidin, beriya biçin ser pirsiyara xwe ya

yekê ku ew jî ev e: Gelo kîjan partiya kurdî, ya xwedî cemawer, ji valetiyekê hatiye?

Partiya niho mijar li ser, PKK ye ku bi parçeyeka Kurdistanê ve, girêdayî ye, ku jimareya xelkê wê ji 25 milyon kesan derbas dibe û gelek caran dihê gotin jî ku gelek ji partiyên destûrdayî yên kurdî li tirkiya bi hêza wî cemawerê ku PKK ê çêkirî yan jî PKK ê heyî li Tirkî dikevin di hilbijatinan de ankuya vê yekê ew e ku PKK hêz û berdewambûna xwe ji hêz û heza wî cemawerê kurd derdixe, yê ku herdem xwe stemlêkirî û bindest û hejar û nizmtir ji xelkê dî yê tirkiya û bêmaf li ser erdê xwe dîtî. Anku û bi dîtina min, çarenivîs û awayê paşeroja wî cemawerî û rengê reftara dewletê pê re, çarenivîsê berdewambûna karê vê partiyê diyar dike û belgeyên dîrokî jî li ser vê yekê pir in, dema ku gel bi her rêka hebe daxwaza hinek mafên xwe bike û hîngê aliyê desthelatdar çi dûr çi nêzîk dibe li wan daxwaziyan xwedî derbikeve.

Li vê derê ji nû em dê ên ser bersiva pirsiyara xwe ya yekê, erê bi (qirikirina) PKK ê dê doza kurdî li tirkiya bi dawî hêt?

Li gorey wê yeka em li serî bo çûyîn ji bo bi dawîanîna doza basjêkirî, du rê hene: Rêka yekê jinavbirin û qirkirina her 30 milyon kurdan e li Kurdistana Tirkî û helbet jî ev e sed ji sedê mehale, çunku Ermeniyên ku di çaxê qirkirinê de pirosesa qirkirina wan bi rêve çûyî, îro dîsan bûne kelemê çavê dewleta tirkiya û qir nebûne.

Rêka duyê, rêka aştî û dîmokirasiyê ye ku gereke hizirmendên tirk, beriya eskeran, hizra xwe têde bikin, ku pêdivî ye di çarçûveyê mafê mirov û pirinsîpên çarenivîsê gelan de, reftar bi wê dozê re bihê kirin û bi vê rêkê, ya ji min ve, dewleta tirkiya dema li gelê kurdê bakûr xwedî derdikeve, hîngê pir bi hêsanî dikare PKK ê ji,çek bike, anku li vê derê hevkêşeyeka matmatîkî heye û dibe bi mêjiyekî vekirî kar bo bihê kirin. Niho di çavê kurdên bakûr de, PKK daxwazkerê mafên wan e û dikare mafên wan yên windabûyî bo wan peyda bike, lê ger dewleta tirkiya, xwe bi xwe, mafên wan yên windabûyî pê bibexşe, hîngê dewlet dê bibe xudana wan û PKK jî çu têhna xwe namîne yan jî dê bikeve di çarçûveyekî hevçerx û dîmokrasî de, ku dewlet bi xwe jî, dê jê razî bibe. Sebaret vê yekê û di bersiva pirsiyareka kovara Gulan de ya ku li Hewlêrê, paytextê herêma Kurdistanê, derdikeve ku ka hûn çareseriya kêşeya kurdî li tirkiya çawa dibînin? Serokê herêma Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî got: "Bêguman çareseriya serbazî serketî nabe, dibe çareseriyeka siyasî û aştiyane be, lê ev yek jîçawa dibe, bêguman wê jî peywendî bi wan bi xwe ve heye, ez naxwazim biçim nav hûrdekariyan, lê guman têde nîne ku çareseriya serbazî dê faşil bibe".